

Infiliwenza berazan

(**xenzîran**) Memê Alan

Ev nexweşiya , nexweşiyeke dîrokî ye , cara yekê , sala 1918-1919 an li İspaniya peyda bû . Di encam de , bi milyonan mirov bi vê nexweşiyê ketin , û ji wan bêtirî milyonekê mirin . Wêlomê wê hîngê , ew bi infilewenza İspanî bi nav bû . Herweha li sala 1958an , ew li Rûsiya bi nav xelkê wir ket , paşê dîsa li wir , sala 1974an belav bû , û bi Infiliwenza Rûsî hate navdan . Hêjaye em wînin zimên , ku veyrûsa vê nexweşiyê , ji berazan derbasî nav mirovan dibe . Wêlomê jî ew bi Infilewenza berazan tête binavkirin. Nîşanên vê nexweşiyê , pir nêzîkî nîşanên sermagirtinê ye . Mirovê ku bi infilewenza berazan ketibe , empişkê wî hiltên , dikuxe , germ dibe (nîşaneke bingehî ye) , av ji çav û pozê wî diherike , û gewriya wî ziwa dibe û dişewite . Le tuştê vê rengî ji infiliwenzên dî cuda dike ku nîşanên xwe hêzbiindin û li rex nîşanên borî , nîşanin din hundurî di made û rovîkên mirovan de çêdibin , mîna : Made lihevketin , vereşandin , navçûn û zîkêşê . Û ew bi vegirtinê ji mirovekî dere mirovekî dî , yanê di riya têkildariyê (kontektê) re . vêca xwejêparastin û tenduristkirina ji vê nexweşiyê , berî hertiştî bi xwepaqijiyê , û li kêlek wê dûrketina mirov ji wan kesên bi veyrûsa vê nexweşiyê ketine ye . Yanê mirovê ku pêhesî , ku nîşanên vê nexweşiyê li ba wî peyda dibin , pêwîste weha bike .

1-Xwe ji kesên derdora xwe bi dûr xwe , ta ku , tukesî din jê venegire .

2-Xwe vehesîne (rihet bike) , ji ber ku kesê bi vê nexweşiyê , vehes pê gereke .

3-Pêwîste laşê wî , dest , û alavên pê dixwe û vedixwe , an jî bi kar tîne baş bi hin dermanên paqijiyê herdem bêne paqijkirin .

4-Pût û pêdan bi xwarin û vexwarina wî bê kirin . Divê ew bêtir zorê di xwarina xwe de bide tiştên ron û fêkiyan . Yanê her xwarinên ku berevaniya wî li dij wê nexweşiyê zêde dike

Li dawiyê ev nexweşiya normal û ne pir bive ye , ger mirov zana û têgihiştîyê wê be .

Kewîs Axa Kî Ye?.

Wês kurê Ehmedê Cemîlê Kanebî, ji êla Herkiyan e. Di sala 1889 an de, li zozana Çarelê ji dayîk bû ye. Kewîs Axa riya bavê xwe digre û dibe şivanê pêz. Di ber şivantiyê re, di navbera deştên Rojhilatî Mûsil û zozana de, hunera wî bilind dibe.

Di dehsaliya wî de ,bav dimre, diya wî Leyla goçberî gundê meta wî- Hekariya Soran – dibe. Li wir dê jî dimre. Pişrî mirina dê, dibe şivanê pezê Ehmed Xanê Herkî. Bi mirina bav û diya xwe pir dêşe , û êşa xwe di stranan de diherkîne. Di sala 1915 an de, dev ji şivantiyê berdide û dest bi dengbêjiyê dike û li Rawendizê, li ba Hecî Newrozê Bawel Axa bi cîwar dibe û li wir dibe denbêjê dîwanxanan. Piştî Rawendizê, di sala 1916 an de, ji hêla Rûsan ve tê dagîr û şewitandin, û bi axayê xwe re, penabrî Şeqlawaya dibe .Di dema Osmanîyan de, axê wî dibe fermanê Şeqlawaya û ew jî dibe berpirsiyarê embara xwerinê. Kewîs Axa, hin ji xwerina leşkeran bi dizî dide xelkê wê deverê yê hejar. Li Şeqlawaya keça Mehmûd Şerîfî dixweze û çar zarokan tîne, Ehmed, Mihemed, Ebdela û Cemîl. Piştî demekê berê xwe dide Hewlêrê û li wir ne tenê di dîwanên axan de , belê , di Çayxana Elî Felehî de stranan dibêje .Di sala 1930î de, diçe Bexdadê û li wir hin stranan xwe tomar dike. Kewîs Axa li Bakur, Başûr û rojhilatî Kurdistanê geryaye û ew çend caran çûye ba Şêx Mehmûd Hefîd û İsmail Axayê Şikakî û stran li ser wan gotine.

Kewîs Axa di sibata 1936 an de, diçe serdana mirovên xwe yê li devera Pîrmamê û li gundê Herşemê nexweş dibe û li wir goç bardike.Û xanima wî, di sala 1982 an de ji dunyayê bardike.

Kewîs Axa stran wek ava çemê Çetelê ji devê wî diherikîn, û ew ji dengbêjên herî navdar yê Kurdistanê bû.

Stranên Kewîs Axa yê herî navdar : Gênc Xelîl , Melîko , Şêx Mehmûd , İsmail Axa . De Xalo, Lo,Lo Peyayo, Çemê Çetelê , Delal, Bêrivanê , Sevgan , Dotmam û Narê Hey Nar.

Hêjayî gotinê ye ku, di 22-11/ 1999 an de, şalyarê rewşenbîrî yê Kurdistanê, birêz Felakedîn Kakeyî , li bajarê Şeqlawaya perde ji ser peykerê Kewîs Axa rakir.